



Zilamê dewlemend û cotkar

- çîrokek ji Marokoyê

Carek ji caran, li diyarekî dûr,
li naverasta çoleke mezin û bêdeng, bajarekî biçûk ê erebî hebû. Li navenda bajêr bazarek hebû -
bazareke mezin a ku gel tê de kirîn û firotin dikir. Li bazarê bi hezaran kuçe û kolanên teng hebûn.
Li her kuçeyekê bi hezaran dikanên rengîn hebûn. Mirov dikaribû her tiştê di navbera erd û asîman de bi
kire.

For lenge lenge siden, langt langt borte, midt i en stor og stille ørken, var det en liten arabisk
by. Midt i byen var det en basar – en stor markedsplass der folk samlet seg for å handle.
Basaren hadde tusenvis av trange gater og smug. I hvert eneste smug og hvert eneste hjørne
var det tusenvis av fargerike butikker der man kunne kjøpe alt mellom himmel og jord.



Li wir, di kolaneke qelebalix de, zilamekî dewlemend ji xwe re derketibû gerê. Cil û bergên xweşik û giranbuha li wî bûn; qapûteke dirêj ê hevrîşimî ji Çînê, zincîrek zêr ji Persîayê, û xelekek elmas ji Hindistanê bi wî ve bûn. Zilamê dewlemend mîna teyrê tawis bi pozbilindî û jixwerazî dimeşîya. Qapûtê wî yê dirêj li pey wî dixîşiqî. Zilamek diqîrîya «Hişyar be, hişyar be!» Ji nişka ve zilamê dewlemend dît ku cotkarekî belengaz bi lez bi ser wî ve tê.

Cilên qirêj û qetîyayî li cotkar bûn û barekî giran ê êzingan li ser pişta wî bû. Pişta cotkar tewandî bû û pêşîya xwe nedidît. Ji bo ku ew li tu kesî nekeve, ew diqîrîya û digot «Hişyar be, hişyar be!» Ji bilî zilamê dewlemend, xelkê din hemûyan xwe didan alîyekî. Zilamê dewlamend li ser rê ma û ji xwe re got, “Ma xêr e, ez xwe ji bo cotkarekî belangaz û cil qetîyayî bidim alî?”

Her inne i folkemengden var det en rik mann som gikk tur. Han hadde på seg fine og dyre klær; en lang silkekåpe fra Kina, gullkjede fra Persia, og diamantring fra India. Den rike mannen gikk som en påfugl, med nesa høyt i været og hevet bryst, mens han lot den lange kåpen dras langs bakken.

«Pass deg, pass deg!» Plutselig så mannen en fattig bonde som kom raskt mot han. Bonden hadde på seg møkkete og slitte klær. På ryggen bar han en stor og tung bunt med fyringsved. Bonden gikk med bøyd rygg og kunne ikke se folk foran seg. Så for å ikke komme bort i noen ropte han: «Pass deg, pass deg!» Alle folk flyttet seg, bortsett fra den rike mannen. «Hvorfor skal jeg flytte meg for en fattig bonde med ødelagte klær?» tenkte rikmannen og stod i veien.



Cotkar ji nişka ve li zilamê dewlemend qelibî. Zilamê dewlemend ket erdê û barê êzingan jî bi ser wî de ket. Zilamê dewlemend kete nav herîye û cilên wî yên xweşik hemû bûn qirêj.


Plutselig krasjet bonden med den rike mannen. Rikmannen falt ned og ved-bunten falt over ham. Han ble dynket ned i gjørme og de fine klærne hans ble ødelagt.



Zilamê dewlemend gelek hêrs bû û bi dengekî bilind got

“Tu neçarî hesabê vê yekê bidî!”. Zilamê dewlemend bi gerdana cotkar girt
û ew bi xwe re, ber bi dadgera bajêr ve bir.

«Dette skal du betale for!» skrek den rike mannen sint. «Bli med meg!» Rikmannen tok tak i
bondens krage og dro ham med seg til byens dommer.



Li dadgehê, zilamê dewlemend got ku ew ji xwe re li bazarê digerîya, û gava ku cotkar bi ser wî ve hat, wî tişteke nebihîst û cotkar jî ew hişyar nekir. Zilamê dewlemend got “Cotkar bi zaneyî cilên min lewitandin”. Dagder jê pirsî û got “Gelo çima cotkar dê tişteke wilo bixwaze?”

Zilamê dewlemend bersiv da û got “zikê wî ji min êşîya, ji ber ku cilên min ji yên wî xweşiktir in”. Dûvre dadger berê xwe da cotkar û jê pirsî: “Çima te cilên zilamê dewlemend lewitandin?”

Cotkar bêdeng ma û qet neaxivî. Dadger dubare ji cotkar pirsî “Qey te nebihîst? Çima te cilên zilamê dewlemend lewitandin?”

Cotkar dîsa bêdeng ma. Dadger hêrs bû û bi dengekî bilind got: “Ez ê dubare bikim “Çima te cilên zilamê dewlemend lewitandin?”

Berdewam cotkar bêdeng ma. Dûvre dadger zîvirî û berê xwe da zilamê dewlemend û bi hêrs got: “Ma qey tu nabînî ku cotkar lale?” Dadger berdewam kir û got “Tu çawa ji yekî lal daxwaz dikî ku te hişyar bike?”

I retten fortalte den rike mannen at han gikk rundt på basaren og hørte ingen ting da bonden kom mot han, fordi bonden ikke varslet han. «Bonden ødela mine klær med vilje,» sa den rike mannen. «Hvorfor skulle bonden gjøre noe slikt?» spurte dommeren. «Fordi bonden var sjalu på meg som har finere klær enn ham,» svarte rikmannen.

Deretter spurte dommeren bonden: «Hvorfor ødela du klærne til den rike mannen?» Bonden stod musestille og sa ikke ett eneste ord. «Hørte du ikke? Hvorfor ødela du klærne til den rike mannen?» gjentok dommeren. Bonden sa fortsatt ingenting. «Jeg gjentar: hvorfor ødela du klærne til den rike mannen?» sa dommeren. Men fortsatt kom det ikke et eneste pip fra bonden.



Zilamê dewlemend bersiv da û got “Na, na! Nexêr! Ew dikare biaxive!!

Min bi xwe dengê wî bihîst: Wî gelek caran qîr dida û digot “«Hişyar be, hişyar be!»

Da sa dommeren til den rike mannen: «Ser du ikke at bonden er stum? Hvordan kan du kreve fra en som ikke kan snakke at han skal varsle deg?» sa dommeren. «Åh jo!!! Jo! Han kan snakke!! Jeg vet at han kan snakke!! Jeg hørte ham. Han ropte høyt: Pass deg!! Pass deg!! Mange ganger!», svarte den rike mannen uten å tenke.



Dadger,

ji bo ku zilamê dewlemend derew kir, ew ceza kir. Wî divîyabû 1000 pareyên zêrîn bide cotkar û

di ser de jî divîya bû li qadê li pêşberî gel bisekine û biqîre:


Ez zilamekî qure bûm û min nedixwest parve bikim

ji ber vê yekê ez ketim nav herîyê

û min cilên xwe yên xweşik û giranbiha

qirêj kirin.

Dommeren straffet den rike mannen for å ha løyet. Han måtte betale 1000 gullmynter til bonden og i tillegg måtte han stå på torget foran alle folk på basaren og rope: «Jeg var sjølgod og ville ikke dele. Derfor falt jeg ned i søla og ødela min fine og kostbare klede». Og snipp snapp snute, så var eventyret ute.





Illustratør: Svetlana Voronkova

Se flere fortellinger på morsmal.no